DI PERSPEKTÎFA DADMENDIYA DEMA DERBASBÛNÊ RE LI ERDHEJÊ NIHÊRÎN: PÊŞNIYARÊN POLÎTÎKAYÊ YÊN JI BO PIŞTÎ 6'Ê SIBATÊ

MERTCAN DOĞAN
YAREN ARABACI



CONTENTS

PÊŞKÊŞ 02

PAŞPERDE 04

DADMENDIYA DEMA DERBASBÛNÊ 06

BANDORA KARESATÊN XWEZAYÎ YA LI SER MAFÊN MIROVAN Û DADMENDIYA CIVAKÎ 08

TECRUBEYÊN CÎHANÊ: MÎNAKÊN HAÎTÎ Û NEPALÊ 13

PÊŞNIYARÊN JI BO POLÎTÎKAYÊ 19

Komeleya Demokrasî, Aştî û Lêkolînên Polîtîkayên Alternatîf

Di Perspektîfa Dadmendiya Dema Derbasbûnê re li Erdhejê Nihêrîn: Pêşniyarên Polîtîkayê yên ji bo Piştî 6'ê Sibatê

Tîrmeha 2023

Nivîskar
Mertcan Doğan, Yaren Arabacı

Edîtor
Güneş Daşlı

Sererastkirin
Sevcan Tiftik

Werger
Aren Yıldırım

Dîzayn
Volkan Muyan

Wêneyê Bergê
Link

Têkilî

Kavaklıdere Mah. Beykoz Sk. No: 14/5
Çankaya/Ankara 06540
info@demos.org.tr
www.demos.org.tr
Twitter
Facebook
Instagram
LinkedIn

Ev rapor bi piştgiriya Friedrich Ebert Stiftung (FES) a Tirkiyeyê û Europen Endowment for Democracy (EED) hatiye amadekirin.

TABLOYA KURTEYAN

AFAD	**Serokatiya Rêveberiya Karesat û Rewşa Awarte**
bnb	**Berhema navborî**
dnz	**Dîroka nayê zanîn**
CNVJ	**Commission nationale de vérité et de justice (Komîsyona Heqîqet û Edaletê ya Haîtiyê)**
CPN-M	**Communist Party of Nepal-Maoist (Partiya Komunîst-Navenda Maoîst a Nepalê)**
DDD	**Dadmendiya Dema Derbasbûnê**
KHL	**Komîsyona Heqîqet û Lihevkirinê**
İHD	**Komeleya Mafên Mirovan**
İHSDA	**Tora Piştgiriyê ya Parêzvanên Mafên Mirovan**
RCS	**Rêxistinên Civaka Sivîl**
TİHV	**Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê**
WOREC	**Women's Rehabilitation Centre (Navenda Rehabîlîtasyonê ya Jinan)**

PÊŞKÊŞ

Di Erdhejên 6'ê Sibatê de bi hezaran kesan jiyana xwe ji dest da, bi sedan avahî xirab bûn û xisar lê bû, bi milyonan mirov ji cih û warên xwe bûn. Li gel nebûna pêdiviyên bingehîn ên wekî stargeh, xwarin û avê yên piştî erdhejan û kêmasiya xebatên lêgerîn û rizgarkirinê, gavên ji bo dabînkirina edaletê ji girtina çend avahîsazan wêdetir neçû. Tecrubeyên erdhejên berê yên wekî Erdheja Duzceyê (1999) nîşan didin ku ev darizandin bi demê re dibin dosyayên girtî û tu berpirsên siyasî nayên darizandin. Lê paşguhkirina aliyê siyasî yê karesatê tê wateya paşguhkirina têkçûna hikumetan di kêmkirina rîsk, plansaziya karesatê û ji nû ve avakirinê de. Dema karesatên xwezayî wek xetereyên bêçare têne dîtin û tenê li ziyanên ku ji ber karesatê bi xwe çêbûne binêrin, ziyanên ji ber binpêkirinên rayedaran yên beriya karesatê û piştî wê, nayên dîtin. Bi ser de jî bandora wêranker a binpêkirina mafên komên marjînalkirî û rastî tundîa binyatî tên, nayê dîtin. Her ku mexdûriyeta li herêmê giran û mayînde dibe, girîngtir dibe ku mirov lêkolîn bike bê ka bi kîjan rê û rêbazan ji bo kesên ku bandora erdhejê lê bûye dadmendiyeke baş dike/restore dike, dikare pêk were.

Wek Komeleya Lêkolînê ya DEMOS'ê, angaşta me ew e ku çarçoveya ku dadmendiya dema

derbasbûnê (DDD) diyar dike û mekanîzmayên pêşniyar dike -qadeke sereke ya xebata me ye-, dikare piştî karesatên xwezayî dadmendiya civakî pêk bîne. Em dibêjin karesat jî mîna di demên şer û pevçûnan û rejîmên otorîter de, binpêkirinên mafan ên giran bi xwe re tînin û ji ber vê yekê divê pêvajoya xwegihandina edaletê ya piştî karesatan bi perspektîfeke mafparêz bê nirxandin. Divê di destpêka raporê de bê diyarkirin ku DDD ne wek darikê sêrbaziyê ku dê hemû pirsgirêkên piştî erdhejê çareser bike, lê belê ji ber ku dê bandoreke pêşvebirinê li ser rêbazên alternatîf û nû bike, me kir esas. Rêbaza DDD'ê xwe dispêre pênc hîmên bingehîn; lêgerîna heqîqetê, dadmendiya ceza, restorasyon, reforma saziyî û bîrdarkirinê û ew potansiyela wê heye ku ji bo gavên piştî erdhejê rê nîşanî biryardêran û civaka sivîl bide.

Di çarçoveya vê raporê de ku armanc dike ku vê potansiyelê derxe holê: Di serî de em ê agahdariya paşperdeyê pêşkêş bikin û dadmendiya dema derbasbûnê bi gelemperî wek qadeke lêkolînê ya akademîk û bi awayekî pratîk bidin nasîn. Ya duyemîn; em ê hewl bidin bandora karesatên xwezayî yên li ser mafên mirovan û dadmendiya civakî ji hêla komên cuda yên civakî û nasnameyên cuda ve binirxînin. Paşê, em ê lê binêrên ka çawa DDD dikare di çarçoveya piştî erdhejê de bê bikaranîn, derfetên me yên heyî bidin ber çavan bigirin û em ê cih bidin tecrubeyên cîhanê yên ku dikarin bi perspektîfa DDD'ê bên nirxandin. Di dawiyê de jî em ê rêzepêşniyazên polîtîkayê pêşkêş bikin ku em difikirin ji bo pêkanîna dadmendiya civakî ya piştî erdhejê girîng in. Ev pêşniyar di serî de ji bo civaka sivîl û biryardêran bin jî, armanca me ya sereke li vir ew e ku zimanê raporê heta mimkun be hêsan bikin û rêberek zelal ji bo hemû kesan çêkin ku dixwazin li dadmendiyê bigerin.

Wêne: Li navçeya Samandag a Hatayê meşa jinan a çilrojiyê ya ji bo bîranîna kesên jiyana xwe ji dest daye. (Çavkanî) https://twitter.com/ekmekvegul/status/1637082574735433728

1. PAŞPERDE

“

Dema rewşa heyî ya li Tirkiyeyê were nirxandin, tê dîtin ku krîza mirovî hîna çareser nebûye û her roj binpêkirinên mafan ên nû derdikevin holê. Nebûna xwegihandina ava paqij a vexwarinê, pirsgirêka gemarê ya ji ber zêdebûna germahiya hewayê û nexweşiyên epîdemîk, pirsgirêkên herî girîng ên erdhejzedeyan in.

Erdhejên di 6’ê Sibatê de pêk hatin, bûn sedema yek ji hilweşînên herî mezin ên dîroka Tirkiyeyê. Li gorî daneyên fermî heta niha zêdetirî 50 hezar kesî jiyana xwe ji dest daye, zêdetirî 156 hezar avahî hilweşiyane yan jî di asta hilweşînê de xisar lê bûye û bi milyonan kes ji cih û warên xwe bûne[1]. Di erdhejê de wekî berê li Tirkiyeyê û li deverên cuda yên cîhanê jî di karesatên xwezayî de binpêkirinên mafên mirovan ên giran çêbûn. Gelê herêmê di encama polîtîkaya rantê ya hikumetê ya beriya erdhejê de neçar ma li zeviyên çandiniyê avahiyan çêke yan jî li avahiyên qaçax ên li hember erdhejan nesaxlem bijî. Tevî baca erdhejê ya 38 milyar dolar a di nava 23 salan de hat komkirin jî, navê wê yê fermî baca ragihandina taybet[2] e, sersariya dewletê ya berî û piştî karesatê rê li ber zêdebûna mirinan û girnabûna krîza mirovî vekir. Ji ber bêderfetiya rêveberiya krîzê û nebûna birêxistinbûyîna di xebatên lêgerîn û rizgarkirinê de, bi hezaran mirov di binê xirabeyan de asê man û gelekan jiyana xwe ji dest da. Mafên bingehîn ên wekî starbûn û xurekê yên erdhejzedeyan jî hatin astengkirin û ji ber nasnameyên xwe cudakarî li dijî wan hate kirin.

Piştî erdhejê, bi taybetî mexdûrên erdhejê; partiyên siyasî, rêxistinên girseyî yên demokratîk û rêxistinên mafan dest bi daxwazên xwe yên edaletê kir. Lê belê hikumeta AKP’ê erdhej wek “karesata sedsalê” bi nav kir û bi feraseteke çarenûsî bala xwe dayê, piraniya wan daxwazan paşguh kir. Dema krîza mirovî ya wêranker a li herêma erdhejê dewam dikir, serokkomar Recep Tayyîp Erdogan got “Ne mimkun e di karesateke wiha de hin kêmasî çênebin” û “daxwaza heqhelalkirinê[3]” kir. Ev jî mînakeke şênber a helwesta hikumetê bû ku berpirsyariya xwe da aliyekî. Li Hatayê ku yek ji wan bajaran e ku herî zêde erdhejê bandor lê kiriye, gel derket kolanan û dirûşmên “Em heqê xwe helal nakin”

1 “6 Şubat’taki Depremlerde Can Kaybı 50 Bin 500’e Yükseldi”. BBC News Türkçe, 7 Adar 2023, https://www.bbc.com/turkce/articles/c51kdv8d15jo (dîroka tikandinê: 26.05.2023).

2 “Deprem vergisi: 23 yılda ne kadar vergi toplandı, bununla kaç konut yapılabilirdi?”. Euronews Türkçe, 11 Sibat 2023, https://tr.euronews.com/2023/02/11/deprem-vergisi-22-yilda-ne-kadar-vergi-toplandi-bununla-kac-konut-yapilabilirdi (dîroka tikandinê: 29.05.2023).

3 “Deprem: Erdoğan Hatay’da da helallik istedi, ‘Böylesi bir felakette kimi aksaklıkların yaşanmaması mümkün değil’ dedi”. BBC News Türkçe, https://www.bbc.com/turkce/articles/cje5dlqd71lo (dîroka tikandinê: 29.05.2023).

berz kirin û ev yek protesto kir[4]. Lewma jî di çarçoveya nîqaşên li dijî "heqhelalkirinê" de ku beriya erdhejê serokê muxalefeta sereke Kemal Kiliçdaroglu dabû destpêkirin û DEMOS'ê jî di weşanên cuda de bi perspektîfa rûbirûbûnê bi paşerpjê re bi awayekî rexnegir nirxandibû, piştî erdheja 6'ê Sibatê lêgerîna li edaletê jî lê hat zêdekirin û careke din heqhelalkirin di çarçoveya karesatên mezin de hat bikaranîn. Her wekî me berê jî nîqaş kir, her hewldaneke heqhelalkirinê ku rûbirûbûneke rasteqîn armanc nake, bi tenê garantiya domandina bêcezahiştinê ye.

Dema rewşa heyî ya li Tirkiyeyê were nirxandin, tê dîtin ku krîza mirovî hîna çareser nebûye û her roj binpêkirinên mafan ên nû derdikevin holê. Nebûna xwegihandina ava paqij a vexwarinê, pirsgirêka gemarê ya ji ber zêdebûna germahiya hewayê û nexweşiyên epîdemîk, pirsgirêkên herî girîng ên erdhejzedeyan in. Hilbijartinên parlamentoyê û serokkomariyê yên Gulana 2023'yan jî bûn sedem ku li Tirkiyeyê guhertineke radîkal di rojevê de çêbe û krîza heyî kete rêza duyemîn. Sozên ji bo herêma erdhejê di dema hilbijartinê de ji aliyê hikumeta AKP'ê ve hatine dayîn, hîna bi cih nehatine. Ji ber nêzbûna hilbijartinên herêmî yên 31'ê Adara 2024'an, divê krîza giran a li herêma erdhejê nekeve rêza duyemîn û pirsgirêk bi perspektîfeke mafparêz were dîtin.

4 Karadoğan, R. "Hataylılar ellerinde reyhanlarla haykırdı: Hakkımızı helal etmiyoruz". Diken, 19 Mart 2023. https://www.diken.com.tr/hatay-lilar-ellerinde-reyhanlarla-haykirdi-hakkimi-zi-helal-etmiyoruz/

2. DADMENDIYA DEMA DERBASBÛNÊ

Dema krîza mirovî ya wêranker a li herêma erdhejê dewam dikir, serokkomar Recep Tayyîp Erdogan got "Ne mimkun e di karesateke wiha de hin kêmasî çênebin" û "daxwaza heqhelalkirinê" kir. Ev jî mînakeke şênber a helwesta hikumetê bû ku berpirsyariya xwe da aliyekî.

Dadmendiya Dema Derbasbûnê (DDD) têgeheke sîwanî ye ku mekanîzmayên dadgeriyê û derveyî dadgeriyê ji bo rûbirûbûna binpêkirinên mafên mirovan ên giran ên di demên pevçûn an jî di dema rejîmên otorîter de tên bikaranîn û bidawîkirina bêcezahiştinê û veguherîna ber bi civakeke aştîxwaz û demokratîk ve tê bikaranîn. DDD li gorî analîzeke paşpêkî ye hewl dide rastiya li pişt binpêkirinên demên berê derxe holê, berpirsyaran bidarizîne û zirarên ji ber binpêkirinan çêbûne, telafî bike û ji aliyê din ve jî nêzîkatiyeke proaktîf[5] e ku hewl dide pêşî li binpêkirinên siberojê bigire.

Wek qadeka lêkolînê û sepanê DDD rasterast li gorî tecrubeyên cîhanê hatiye sazkarkirin. Mekanîzma û nêzîkatiyên pêşniyarên DDD'ê li gorî çarçoveyê diguhere û lewm jî em dikarin bibêjin ku ji bo pêkanîna dadmendiya dema derbasbûnê rêzikên yekser ku divê bêne şopandin, tune ne. Mekanîzmayên DDD'ê, li gorî peywendên welatan û hewcehiyên taybet dikarin di kombînasyonên cuda da werin bikaranîn. Bo nimûne, hin welat girîngiyê bi dozên cezayî didin, lê hinek girîngiyê bi komîsyonên heqîqetê yan jî bernameyên tazmînatê didin. Di nava lîteratura DDD'ê de bi tenê nêzîkatiyên li ser mafên sivîl û siyasî yên mîna mafê jiyanê û qedexekirina îşkenceyê û pêşniyar/ferzkirina heman mekanîzmayan li ser her peywendekê tên rexnekirin. Li gel vê, nêzîkatiyeke ku li ser mafên aborî, civakî û çandî disekine, ji bo veguherîna newekheviyên binyadî yên herêmî wekî yên girêdayî peywendê, pêvajoyên beşdarîxwaz û cudakariya li ser zayend, nîjad û etnîsîteyê girîng e. Dîsa jî em dikarin bibêjin DDD xwedî pênc merhele/stûnên bingehîn e ku ji bo gelek tecrubeyên cîhanê hevpar in. Ev dikarin wiha werin rêzkirin:

Lêgerîna li heqîqetê, pêwîstiya derxistina rastiya têkildarî binpêkirinên mafên mirovan îfade dike. Mekanîzmaya herî zêde ya ji bo aşkerakirina rastiyan tê bikaranîn jî komîsyonên heqîqetê ne. Komîsyoneke heqîqetê, ji bo berhevkirin û nirxandina şahidî û îfşaatan, belgekirina binpêkirinan, tespîtkirina kiryar û mexdûran û analîzkirina sedemên bingehîn ên tundiyê dikare bê bikaranîn.

Stûna duyemîn **edaleta ceza** ye û armanc dike ku kesên bûne sedema binpêkirinan ji kiryarên xwe berpirsyar bin. Edaleta cezayî, girêdayî çawanî û çarçoveya sûcên hatine kirin, dikare bi rêya dozên cezayî yên neteweyî yan jî navneteweyî pêk were. Edaleta ceza dikare ji bo mexdûr û mirovên ji tundiyê rizgar bûne hesta dadmendiyê peyda bike, pêşî li binpêkirinên piştre bigire û baweriya bi serdestiya hiqûqê xurt bike.

Restorasyon jî tê wateya tazmînat û telafiya ji bo mexdûr û mirovên ji binpêkirina mafên mirovan rizgar bûne. Armanca restorasyonê ew e ku rûmeta qurbaniyan/kesên sax mane, vegerîne û alîkariya wan bike da ku piştî trawmaya binpêkirinan jiyana xwe ji nû ve ava bikin. Restorasyon, bi şêweyên cuda yên mîna tazmînata diravî, vegerandina mal û milkan, rehabîlîtasyon û alîkariya tenduristiyê, lêborîna fermî yan jî **garantiya dubarenekirinê** dikare

5 Proaktîf: Niyet an jî armanca bidestxistina encameke baş an jî xwe ji pirsgirêkan parastin, li şûna ku heta pirsgirêk derdikeve holê. (Bnr. proactive (2023). https://dictionary.cambridge.org/dictionary/english/proactive.

pêk bê.

Garantiyên dubarenekirinê, bi çareserkirina sedemên tundiyê, vîneke siyasî nîşan dide ku pêşî li binpêkirinên mafên mirovan yên di siberojê de bigire. Ev soza "teqez careke din nabe" ye. Ev soz, wekî reformên dadgeriyê û saziyên polîsan, reformên destûrî û tevdîrên din ên bi mebesta pêşxistina çanda rêzgirtina li mafên mirovan û serdestiya hiqûqê, dikare bi reformên sazûmaniyê ku aliyekî din ê DDD'ê ye, were xurtkirin.

Reformên saziyî, armanc dike saziyên ku bûne şirîkên van binpêkirinan an jî bi îhmalan bûne sedema binpêkirinan vesaz bike. Ev reform dibe ku guhertinên qanûn, polîtîka û sepanan bin û perwerdekirin û hişyarkirina kadroyên ku di wan saziyan de dixebitin ku dibin sedema binpêkirinan jî tê de hebe.

Çêkirina bîrdariyê jî armanc dike ku bandorên psîkolojîk, hestyarî û çandî yên bûyerên biêş, bi qebûlkirina êşên mexdûran, parastina bîranîna tiştên qewimîne û pêkanîna feraseteke hevpar a têkildarî demên borî derxe holê û bi vî rengî tevkariyê li lihevkirina civakî bike[6].

Bandorên wêranker ên erdhejê ne tenê li Tirkiyeyê, li Sûriyeyê jî bi giranî hatin hîskirin.
Wêne: Abdulmonam Eassa

6 Lawther, C., Moffett, L., & Jacobs, D. 2017. Research Handbook on Transitional Justice. Edward Elgar Publishing eBooks. https://doi.org/10.4337/9781781955314.

3. BANDORA KARESATÊN XWEZAYÎ YA LI SER MAFÊN MIROVAN Û DADMENDIYA CIVAKÎ

Karesat bandoreke giran li tenduristî, ewlekarî û başiya civakê dikin û di vê çarçoveyê de wek "krîzên mirovî" tên pênasekirin, her wiha binpêkirinên giran ên mafên mirovan jî bi xwe re tînin. Piştî karesatan, pêkanîna dadmendiya civakî ku dikare wek pergaleke civakî ya adil û wekhev bê pênasekirin ku tê de her ferd girîng e, mafên wan tên naskirin û parastin, têkoşîna herî girîng e. Giringî ew e ku ewlehiya saxmayiyan pêk were, piştre jî nasnameyeke adil a amûrên başkirinê yên karesatê û pêkanîna polîtîkayên karesatê yên ku bersivê didin pêdiviyên herêmî yên taybet. Divê ev gavên ku ji bo çareserkirina krîza mirovî hatine avêtin, bi avakirina pêvajoyeke berfireh a gihaştina edaletê ya bi daxwazên kesên hatine rizgarkirin were şopandin.

Li trawmaya destpêkê ya şahidiya karesatekê; destwerdana kêm û îhmal, cudakariya di komkirin û belavkirina alîkariyên karesatê û ji cih warê xwe bûyîna demdirêj zêde dibe. Bi vî awayî trawmayeke duyemîn dikare li gel kesên ji karesatê rizgar bûne rû bide û di encamê de têkiliyên civatê û hesta pêbaweriyê ya di navbera dewlet û welatiyan de têk bibe[7]. Her wiha, ev trawma dikare bi rêbazên burokratîk ên giran û neguncaw ku divê ji bo xwegihandina alîkariya piştî karesatê bên meşandin, kûrtir bibe. Divê dewlet û saziyên wê ji bo ku trawmaya erdhejzedeyan dubare nebe; pêvajoyên burokratîk, pêvajodurên cenazeyan û veşartinê, xwegihandina alîkariyan û hwd têra xwe hêsan bike. Mixabin di pratîkê da burokrasî wek xirabiyeke îdarî xuya dike ku piştî 6'ê Sibatê jî mînakên wê hatine dîtin. Wek mînakeke şênber; di 18'ê Sibata 2023'yan de avahiyên hilweşîyayî yan jî xisareke mezin lê bûyî, ji aliyê Serokatiya Rêveberiya Karesat û Rewşên Awarte (AFAD) ve li sîstema e-Devletê wek 'xisareke biçûk' hatine bicihkirin û alîkariya kîrayê ya divê mirovên

Wêne: https://time.com/6253346/turkey-earthquake-syria-how-to-help/

7 Alessandra Jerolleman. 2019. Disaster Recovery Through the Lens of Justice. Palgrave Macmillan: Los Angeles.

*Afet için Feminist Dayanışma Twitter account

ji karesatê rizgar bûne hildin, bi referansa vê sîstemê hatiye dayîn. Ji ber hilweşîna binesaziyê ya piştî karesatê û pirsgirêkên xwegihandina înternetê, zehmetiya serlêdana her malbatekê bi sîstema e-Devletê re jî di nava astengiyên burokratîk de bû[8]. Her wiha gelek kesên ku ji erdhejê sax xelas bûne, nekarîn xwe bigihînin cenazeyên xizmên xwe û Saziya Tiba Edlî û Wezareta Dadê têkildarî kesên di erdhejê de winda bûne bi aşkerayî tev negerîn û rê li ber daneyên têkildarî windahiyan venekirin û ev jî bû sedem ku mafê veşartina miriyan û şîngirtinê bê binpêkirin[9].

Piştî karesatekê mirovên ku hewl didin pêdiviyên xwe yên bingehîn bi cih bînin, dibe ku bi pêvajoyeke "girseyîkirin" û "gelemperîkirinê" re rû bi rû bimînin ku tê de ne tenê wek parçeyên komekê, lê wek şexs tên dîtin û pêdiviyên wan ên şexsî werin paşguhkirin. Ev dibe ku ji ber kêmasiya baldariya li ser hewcedariyên takekesî yên zêde be, dema ku di pêvajoyên rêveberiya awarte û alîkariyê de gurahî û sînordarkirina çavkaniyan hebe. Ev pêvajoya girseyîkirinê û bêwatekirina daxwaz û xwestekên mirovan, dikare bike ku ew xwe bê qîmet hîs bikin.

3.1.Encamên Karesatan ên Girêdayî Zayenda Civakî

Karesatên xwezayî dikarin encamên ku newekheviya zayendî ya heyî herdemî yan jî girantir bikin. Dema em di çarçoveya zayenda civakî de li karesatan dinêrin, em dibînin ku jin û LGBTÎ+ piştî û beriya karesatan di xwegihandina maf û xizmetan de rastî zehmetiyên mezin tên. Piştî 6'ê Sibatê, jin û LGBTÎ+ di warê ewlehî, û mahremiyetê de li cihên starbûnê yên demkî gelek zehmetî kişandin. Rapora "Stargehên Demkî yên Piştî Erdhejê: LGBTÎ+'ên Li Amedê ji Erdhejê Xelas Bûne" ku di 7'ê Adara 2023'yan de hat weşandin, derxist holê ku LGBTÎ+ ji ber meyla zayendî û/yan jî nasnameya zayendî li gorî sîstema zayenda duparêz ji hev hatine cudakirin, tacîz û redkirinê lê kirine[10]. Yek ji encamên herî dijwar ên erdhejê ji bo LGBTÎ+' an jî, li bajarên ku koç kirinê zêdebûna bêhed a kirêya xaniyan e. Dema cudakarî li kîrayên biha zêde bû, kesên LGBTÎ+ li bajarên ku koç kirine, di peydakirina xaniyan de zehmetî kişandin û hewl hat dayîn ku ev pirsgirêk bi hewldanên kollektîf ên torên piştgiriya LGBTÎ+'an were çareserkirin.

Di şert û mercên koçberiya bi zorê û ji chj û warê xwe bûyînê ya ji ber karesatên xwezayî de, jin û zarokên keç bûne mexdûrên bazirganên mirovan, îstîsmara zayendî û tundiyê. Ji bo nimûne; li gorî rapora Ofîsa Muhasebeya Giştî ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, ji sedî 90'ê mirovên ji cihê xwe bûne, rasterast rastî êriş û tehdîtên fîzîkî tên, ji sedî 46'ê jinan jî di bin rîska êrişa zayendî de ne[11]. Ev yek nîşan dide ku piştî karesatê rîskên heyî yên li dijî jinan zêdetir dibin. Jinên koçberbûyî, gelek caran zehmetiyê dibînin ku xizmetên paqijî û tenduristiyê bigihêjin wan. Bo nimûne, piştî erdhejên 6'ê Sibatê, yek ji pirsgirêkên herî zêde yên li qadê ew bû ku yên ku hewceyî berhemên paqijiya menstrual in, zehmetî di gihaştina berheman de hebûn. Pêdiviya pedên paqijiyê ji aliyê piraniya saziyan ve hate paşguhkirin û dema ped hatin peydakirin jî jin ji ber tabûya reglê ya di civakê de, dema ku ped peyda dikirin, şerm

8 Burcu Çalık Göçümlü. 2023. "AFAD 'Afetzede Barınma Desteği' konusunda merak edilen soruları yanıtladı.". Anadolu Ajansı: Ankara. (Dîroka tikandinê: 31.05.2023).

9 Gülsen Solaker. 2023. "Depremde kaybolanlar nerede?". DW Türkçe. (dîroka tikandinê: 20.06.2023)

10 Atalay Göçer, "Deprem Sonrası Geçici Barınma Mekanları: Diyarbakır'da Depremden Hayatta Kalan LGBTİ+'lar", Keskesor Amed LGBTİ+ Oluşumu, Barış için Kültürel Araştırmalar Derneği, 7 Adar 2023.

11 Caroline Clarinval, Matthew R. Hunt. 2014. "Disaster, displacement, and justice: Powers and Faden's theory of social justice and the obligations of non-governmental organizations towards Internally Displaced Persons". Bioethica Forum: Volume 7 / No. 2.

dikirin û diketin tengasiyê[12]. Koma Piştgiriya Femînîst a ji bo Karesatê ku piştî erdhejê yekser ava bû, ji bo tedarîkkirina pêdiviyên jinan, LGBTÎ+'an û zarokên li herêmê, xebat kirin. Bê guman zehmetiyên ji bo jin û LGBTÎ+'an piştî karesatê rû didin, bi van re ne sînordar in. Di nava sînorên vê raporê de em tenê dikarin beşeke biçûk a pirsgirêkên heyî bidin. Lê belê, bi vê vegotina kurt jî tê dîtin; ji bo encamên zayendî yên karesatên xwezayî yên jinan û LGBTÎ+'an gelek girîng e û destwerdan û polîtîkayên armanckirî werin çêkirin.

3.2.Bandora Karesatan a li ser Koçber û Penaxwazan

Karesat dikare bandorên wêranker li penaxwaz û koçberan bike ku jixwe ji ber koçberkirina wan ya bi darê zorê yan ji ber şer û pevçûnan komên lawaz in. Ev bandor ji ber faktorên mîna çavkaniyên kêm, astengiyên ziman, statuya qanûnî û cudakariyê gelekî xurt e. Penaxwaz û koçber gelek caran neçar in di şert û mercên jiyanê yên nebaş de bijîn û bi kêmasî xwe bigihînin xizmetên bingehîn û çavkaniyan. Karesat, bi xirabkirina binesaziya jixwe kêm, qutkirina xwegihandina ava paqij, elektrîk û înternetê, xizmeta tenduristiyê û afirandina nelirêtiya xurekê, dikare qelsbûna van koman zêdetir bike. Her wiha, astengiyên ziman û nezanîna li ser herêmê, dikare ji bo wergirtina hişyariyên demkî û gihandina alîkariyê asteng bin. Mixabin ji bo gelek penaxwazên sûriyeyî yên di dema erdhejên 6'ê Sibatê de li herêma erdhejê dijîn, hemû îhtîmalên li jor behskirî, hatin dîtin. Piştî erdhejê em bûn şahid ku retorîka qurbanî li dijî penaxwazên sûriyeyî tê bikaranîn da ku bala raya giştî ji binkeftinên rêveberiya qeyranê ya dewletê dûr bixe. Ji ber van sûcdariyan, me dît ku penaber piştî erdhejê ji bo desteka wekî xwarin û stargehan bê par mane û rastî tundiya fîzîkî û psîkolojîk hatine. Ji bo penaxwazên sûriyeyî ku gelek ji wan karên nefermî an bêtemînat dikin, erdhejê rê li ber ziyanên kar, kêmkirina dahatê û jê zêdetir jî vekir. Nebûna parastina qanûnî û xwegihandina torên ewlekariya civakî, zehmetiyên aboriyê jî girantir kirin[13].

> **Piştî karesatekê mirovên ku hewl didin pêdiviyên xwe yên bingehîn bi cih bînin, dibe ku bi pêvajoyeke "girseyîkirin" û "gelemperîkirinê" re rû bi rû bimînin ku tê de ne tenê wek parçeyên komekê, lê wek şexs tên dîtin û pêdiviyên wan ên şexsî werin paşguhkirin.**

12 "Depremde regl tabusu: Ped isterken utanıyor. (b.t.)". Ekmek Ve Gül. 12.02.2023. https://ekmekvegul.net/gundem/depremde-regl-tabusu-ped-isterken-utaniyor. (dîroka tikandinê: 21.05.2023)

13 Deniz Sert, Didem Danış, Eda Sevinin. 2023. DURUM TESPİT RAPORU: GÖÇ VE DEPREM. Göç Araştırmaları Derneği: Stenbol.

4. ÇIMA DADMENDIYA DEMA

Di vê raporê de, em diyar dikin ku em dikarin ji derfet û avantajan sûdê wergirin ku dadmendiya dema derbasbûnê pêşkêş dikin da ku pêvajoya derbasbûnê hêsantir bikin. Em di wê baweriyê de ne ku DDD dikare wek hêmanekê piştî erdhejê, çawa ku piştî pevçûn û şer û pêvajoya derbasbûna ji rejîmên otorîter ber bi demokrasiyê ve lîst, da ku piştî erdhejê edalet pêk were. Di vê çarçoveyê de, em difikirin ku şîrovekirina aliyê polîtîk ê karesatan, li şûna ku wan tenê wek diyardeyeke xwezayî bibînin, dê mekanîzmayên ji aliyê dadmendiya dema derbasbûnê ve hatine pêşniyarkirin, watedartir bike. Tenê dema em bi çavekî mafparêz li karesatê binihêrin, em dikarin bibînin û nîşan bidin ku peydakirina alîkariyên karesatê, avakirina stargehan û pêvajoyên jinûveavakirinê yên piştî wê, bi şêweyên cidî û sîstematîk ên tundiyê yên mîna cudakarî û kedxwariyê di nava hev de ne û em dikarin bikin ku gavên pêşîlêgirtinê di vî warî de bên avêtin. Em dikarin bi nêzikatiyên mafparêziyê nîşan bidin ku jin û LGBTÎ+ piştî karesatan bi bûyerên tacîz û îstîsmara zayendî û sûcên nefretê re rû bi rû dimînin û ev sûc gelek caran bê ceza tên hiştin.

Di vê çarçoveyê de, em di wê baweriyê de ne ku sîstema edaleta ceza ya heyî, mîna serdema pevçûnan û piştî şer dibe ku bendewariyan pêşwazî neke, berdêl ji zirarên heyî kêmtir be û ji bo hesabpirsîna ji berpirsyaran rê û rêbazên cuda divên. Di rewşa Tirkiyeyê de, mîna serdemên pevçûnan û piştî şer, em dibînin ku hikumet pabendî prensîba hesabpirsînê nîn e û ji ber astengiyên li ser sîstema dadmendiya ceza ya heyî ya di pergala piştî karesatê de, hêza mexdûran a lêgerîna edaletê asteng kiriye. Li gorî vê nirxandina hewcedariyê, em difikirin ku em dikarin ji nêzîkatiya DDD'ê û mekanîzmayên ku pêşniyar dike, sûd wergirin. Em bêtir girîngiya guhdarîkirina li daxwazên rizgarbûyiyên ji karesatê û naskirina pêdiviyên wan bi dadweriyê, başbûn û restorasyonê û dabînkirina van pêdiviyan fehm dikin. Ji ber ku krîza wêrankar a devera erdhejê berdewam e û ji bo gihandina ava paqij û xureka tendurist jî, gelê li herêma erdhejê tê dikoşe. Ji bo aşkerakirina rastiyên di karesatê derdikevin û her ku diçe zêdetir dibin; em di wê baweriyê de ne ku hem ji bo dabînkirina edaletê hem jî ji bo ku windahî û binpêkirinên mafan ên ku di karesatên gengaz ên siberojê de li welatekî erdhejê yê mîna Tirkiyeyê careke din çênebin û bi vî rengî baweriya civakî ji nû ve ava bikin, dê bi roleke girîng rabin.

Her wiha em difikirin ku bernameyên restorasyonê ku yek ji mekanîzmayên girîng ên DDD'ê ne, di pêvajoya piştî karesatê de dikare di pozîsyoneke navendî de bin. Heke bi hevkariya dewlet û rêxistinên sivîl bernameyên restorasyonê yên berfireh û li ser bingeha pêwîstiyan werin çêkirin, pirsgirêkên ku di pêvajoya jinûveavakirinê de rû didin ên kesên ji cih û warên xwe bûne, dikarin bi bandor ji holê bên rakirin. Bernameyên restorasyonê ne tenê tezmînata malî didin, her wiha başbûna kollektîf jî bi pêş dixin. Avakirina komîsyonên ku heqîqetan derxin holê, ne wek komîsyoneke lêkolînkirina heqîqetan be jî, dibe ku komîsyona lêkolînê ya

meclisê be û binpêkirinên piştî karesatan qeyd bike û wan ji holê rake. Komîsyonên lêkolînkirina erdhejan ku beriya niha gelek caran hatin avakirin, vê carê dikarin ji bo aşkerakirina rastiyê bixebitin. Dibe ku ev komîsyon bibin xwedî wê erkê ku bêdadiyên di rewşên karesatê de lêkolîn bikin û çavdêriyê bikin bê ka hikumet di berpirsyariyê de pêvajoyên plansaziya karesatê û jinûveavakirinê dimeşînin an na. Em girîngiya saziyên fermî û yên derve wek dadgehên navendî di birêvebirina pêvajoyên îdarî de paşguh nakin, lê dikare wek rêbazeke lêkolînkirina guncawbûna restorasyona civakî ya bi rêberiya saxmayiyan û piştgiriya bi armanca kêmkirina rîska karesatê bi pêş ve biçe, bê meşandin. Merasîmên bîranînê û formên din ên bîranînê, dikarin cesaretê bidin mexdûran ji bo qebûlkirina windahiyên xwe û ji nû ve nirxandina polîtîkayan[14].

14 Megan Bradley. 2017. "More than Misfortune: Recognizing Natural Disasters as a Concern for Transitional Justice". International Journal

5. TECRUBEYÊN CÎHANÊ: MÎNAKÊN HAÎTÎ Û NEPALÊ



Ulusal Saray- Port-au-Prince, depremden sonra yıkılmıştı. Ulusal saray Haiti devlet başkanın resmi konutudur. Fotoğraf: Logan Abassi

“Em di wê baweriyê de ne ku mînakên Haîtî û Nepalê û hewldanên biryardêran û rêxistinên sivîl ên di van mînakan de, ji bo pêçandina van birînên piştî karesatê dikarin ji bo restorasyon û pêvajoya edaletê ya li Tirkiyeyê bibin rêber.

Mekanîzmayên DDD’ê yên yekser ji bo dadmendiya dema derbasbûnê yên piştî karesatan hatine xebitandin, di tecrubeya cîhanê da mînakek jê re nîn e. Lê belê ji bo ku piştî karesatê edalet pêk were û başbûnek dê mafparêziyê de çêbe, mînakên girîng hene ku ji hêla perspektîfa DDD’ê ve hatine pêşniyazkirin. Em di wê baweriyê de ne ku hînbûna ji van tecrubeyan, dikare îlhamê bide têkoşîna ji bo edaleta piştî karesatê ya li Tirkiyeyê jî. Lê em dixwazin di çarçoveya vê raporê de ne tenê pratîkên baş, di heman demê de bala xwe bidin zehmetî, astengî û sînordariyan jî. Bê guman divê her erdnîgariyek di çarçoveya şert û mercên xwe yên taybet de bê nirxandin. Jixwe yek ji girîngtirîn xalên ku ev rapor destnîşan dike, pêvajoya başkirina piştî karesatê ya bi nêzîkatiyeke ji jêr ber bi jor ve ye. Ji ber vê yekê, divê têgihaştina herêmî, guhdarîkirina li mijarên ku bandora erdhejê lê bûye û wergirtina erken ji bo hewcedarî/daxwazan, divê hem erka sereke ya biryardêran û hem jî ya civaka sivîl be.

Dîsa jî di vê raporê de me hewl da mînakên Haîtî û Nepalê

of Transitional Justice, 2017, 11, 400–420, doi: 10.1093/ijtj/ijx024.

binirxînin ku aliyên xwe yên wekî yên Tirkiyeyê hene û lê tespîta îhmalên piştî karesatên xwezayî rojeveke herî girîng e. Em difikirin ku ev her du welat dişibin Tirkiyeyê û heta Sûriyeyê jî ku erdhejê pir bandor lê kiriye, lê hema hema qet behsa wê nayê kirin, bi taybetî ji ber rabirdûya xwe ya nakok. Her wiha, civakên behsa wan tê kirin "piştî pevçûnê" yanî civakên ku piştî pevçûn an jî şer ketibin pêvajoyeke lihevkirinê, nîn in. Di van mînakan de, nakokiya civakî bi formên cuda dewam dike. Ji bo kes û civakên ku bi awayekî dîrokî rastî tundiyê hatine, ji ber pevçûnên berdewam, karesatên xwezayî jî rewşê kambaxtir dikin. Em di wê baweriyê de ne ku mînakên Haîtî û Nepalê û hewldanên biryardêran û rêxistinên sivîl ên di van mînakan de, ji bo pêçandina van birînên piştî karesatê dikarin ji bo restorasyon û pêvajoya edaletê ya li Tirkiyeyê bibin rêber.

5.1.Haîtî

12'ê Çileya 2010'an li Haîtiyê bi navenda paytext Port-au-Prince erdhejeke bi pileya 7.0 rû dabû. Erdhejê li welêt rê li ber zerareke mezin vekir û nêzî 220 hezar kesî jiyana xwe ji dest da, bi sed hezaran kes birîndar bûn û zêdetirî milyonek kes ji warê xwe bû[15]. Erdhejê avahiyên hikumetê, nexweşxane û dibistan jî hilweşandin, bandoreke wêranker li civaka Haîtiyê kir ku berê jî li hember xizaniyê li ber xwe dida. Haîtî amade nebû ku karesateke bi vî rengî rû bide, çawa ku li Tirkiye û Sûriyeyê bû. Vê yekê jî di bersivdayîna lezgîn a operasyonên rizgarkirinê û pêşkêşkirina alîkariyê ji bo komên bandora erdhejê lê bûye, rê li ber krîzan vekir. Erdhejê her wiha li Haîtiyê pirsgirêkên binesaziyê û yên sîstematîk û gendelî, rêveberiya nebaş û nebûna binesaziyê derxist holê.
Pêvajoya jinûveavakirinê li Haîtiyê hêdî û dijwar bû. Pêşkêşkirina xizmetên bingehîn, jinûveavakirina avahiyan û peydakirina derfetên kar ji bo komên ku debara xwe ya piştî erdhejê ji dest daye, mijarên sereke bûn[16]. Dibe ku zehmetiya herî mezin a ji bo Haîtiyê sererastkirina sîstema qanûnî û damezirandina serweriya qanûnê, zelalî û berpirsyarî bû. Di encama erdhejê de Wezareta Dadê û Qesra Edaletê (Dadgeha Bilind, Dadgeha Temyîzê û dadgehên asliyeyê di vir de bûn) hilweşiyabûn. Gelek avahiyên dadgehan û navendên polîsan jî xisar dît û dadger, parêzer, dozger, xebatkarên wezaretê û polîsan jiyana xwe ji dest da. Her wiha nêzî 5 hezar girtiyan ji girtîgehên li herêmên cuda firar kiribû[17].

Avakirina serdestiya hiqûqê ne tenê ji ber xitimîna sîstema hiqûqê bû yek ji qadên bingehîn ên têkoşînê ye. Civaka Haîtiyê bi salan bû bi bîra trawmatîk a mêtingeriya Fransayê, bêîstikrariya siyasî û aborî, tundî û newekheviyên civakî re rû bi rû bû. Rejîma Duvalier a otorîter ku ji sala 1957'an heta 1986'an dewam kir, welat xist hembêza binpêkirina mafên mirovan, çewisandina siyasî û xizaniyê. Piştî serhildana gel rejîm jî têk çû lê pêvajoya derbasbûna demokrasiyê gelekî dijwar bû. Pêvajo hêdî dimeşya û di 29'ê Îlona 1991'an de bi derbeya leşkerî hat qutkirin û yekem serokê Haîtiyê ku bi awayekî demokratîk hatibû hilbijartin Jean-Bertrand Aristide, hat sirgûnkirin. Di sala 1994'an de bi piştgiriya DYA'yê vegeriya welatê xwe û ji bo dewra xwe temam bike, careke din hat ser desthilatê[18].

Di sala 1995'an de li Haîtiyê komîsyonek bi navê Komîsyona Heqîqet û Edaletê ya Neteweyî ya Haîtiyê (CNVJ)[19] hat avakirin. Armanca komîsyonê ew bû ku rastiya li ser binpêkirina mafên mirovan a di navbera salên 1991-1994'an de piştî derbeya leşkerî, bidawîkirina bêcezahiştinê û reforma sîstema dadgeriyê ya li Haîtiyê bû. CNVJ bi zehmetiyên wekî mudaxeleya siyasî û çavkaniyên sînordar re rû bi rû ma, lê belê ji bo belgekirina binpêkirinan, guhdarîkirina li şahidiyên mexdûran û analîzkirina sedemên tundiyê, ket nava hewldanan. Di rapora dawîn a CNVJ'ê de di sala 1996'an de hat temamkirin û tevî tezmînat, reforma saziyî û îdarî, darizandina cezayî û tedbîrên nedubarekirinê, hin pêşniyarên berfireh dihewandin. Di raporê de ji bilî tundiya zayendî ya li dijî jinan, bi taybetî îaşret bi mijarên wekî serxwebûna dadgeriyê û perwerdekirina saziyên hiqûqê yên ji bo têkoşîna li dijî gendeliyê hat kirin[20]. Lê îradeya siyasî ya ji bo bi cihanîna pêşniyarên komisyonê li welat lawaz bû û nakokî jî bi hikumeta Aristide re çê bû û rastbûna daneyên komîsyonê hat nîqaşkirin. Ji ber vê sedemê pêşniyarên CNVJyê qet bi temamî nehatin sepandin.

15 Pallardy, R. 2023. 2010 "Haiti earthquake | Magnitude, Damage, Map, & Facts". Encyclopedia Britannica. https://www.britannica.com/event/2010-Haiti-earthquake.

16 O'Connor, V. 2010. The Rule of Law in Haiti After the Earthquake. United States Institute of Peace, https://www.usip.org/publications/2010/04/rule-law-haiti-after-earthquake

17 bnb.

18 Dupuy, A. 2008. "From Jean-Bertrand Aristide to Gerard Latortue: The Unending Crisis of Democratization in Haiti". Journal of Latin American Anthropology, 10 (1), 186–205. https://doi.org/10.1525/jlca.2005.10.1.186

19 Navê komîsyonê ji eslê xwe yê fransî anku "Commission nationale de vérité et de Justice" tê. Kurte ya wê ye.

20 Selvik, Lisa-Marie Måseidvåg. 2022. "Haiti's Truth and Justice Commission: Forgotten Recommendations, Living Demands." Latin American Experiences with Truth Commission Recommendations: Beyond Words Vol. II, edited by Elin Skaar et al., Intersentia, pp. 409–450. Series on Transitional Justice.

Beriya ku Haîtî bi barê berê re rû bi rû bibe, diviyabû bi erdhejê re serederî li krîzeke giran a mirovî û pirsgirêkên binyadî yên ji ber krîzê bikira. Di nava van şert û mercan de her çend hêdî be jî pêvajoyeke reforma qanûnî dest pê kir. Vê pêvajoya reformê bi temamî pêşniyarên di rapora dawîn a CNVJ'ê de esas girtin. Di vê çarçoveyê de mijarên wekî raçavkirina qanûnan, ewlekirina serxwebûna dadgeriyê, jinûveavakirina çarçoveyên qanûnî û têkoşîna li dijî gendeliyê hatin destnîşankirin. Her wiha, însiyatîfên avakirina kapasîteya saziyî, perwerdekirina dadger, dozger û parêzeran û pêşvebirina rêveberiyê, yanî pêvajoyeke reforma saziyî dan destpêkirin, her wekî CNVJ'ê pêşniyar kiribû. Wekî din, ji bo lezandina gihaştina edaletê tedbîr hatin girtin; xizmetên alîkariya hiqûqî hatin berfirehkirin û ji bo avakirina dadgehên mobîl gav hatin avêtin[21]. Bi vî rengî hewl hat dayîn daxwaz û giliyên gel ên li herêmên ketin bin bandora erdhejê bi lez û bez bên komkirin.

Heke di 14 salên beriya erdhejê de îradeyeke siyasî ya bicihanîna pêşniyarên CNVJ'ê hebûya û heke civakê CNVJ hembêz bikira, ji bo ku ev gav bihatana avêtin nediviya erdhej biqewimiya û dibe ku karesat ji krîza mirovî wêdetir neçûya û nebûya hilweşîneke sîstematîk. Lê belê tevî tecrubeyên neyînî jî, hat fêmkirin ku pêşniyara CNVJ'ê ya ku di salên 1990'î de pirsgirêkên binesazî yên li welêt kifş kir, xwedî wê potansiyelê ye ku di başbûna piştî erdhejê ya li Haîtiyê de bi roleke veguherîner rabe. Ji ber vê yekê, karesata erdhejê pirsgirêkên heyî girantir kirin, di heman demê de derfeta jinûveavakirina civakeke adiltir û berxwedêr pêşkêş kir. Di vî warî de, her çend rêyên başkirineke giştî dijwar bin jî, biryardêrî û berxwedêriya gelê Haîtiyê heke bi piştgiriya civaka navneteweyî re bibe yek, dîsa jî dikare ji Haîtiyê re bibe hêvî. Bi mîsogerkirina pêşniyarên CNVJ'ê bi tevahî ku di pêvajoya başkirina piştî karesatê de têkildar in, Haîtî dikare civakekê biafirîne ku prensîbên rastî, dadwerî û berpirsyariyê digire û di dawiyê de pêşveçûna domdar û demokrasiyeke bihêz bi pêş dixe. Lê mixabin tevî ku îro jî bi milyaran dolar li welêt tên xerckirin, Haîtî ji ber lawaziya saziyên giştî û belawelabûna alîkariyên neteweyî û navneteweyî, bi taybetî jî yên saziyên civaka sivîl, nikare bi ser xwe de were. Welat li ber karesatên xwezayî bê parastin dimîne û li derdora paytextê jî bêyî polîtîkayeke plansaziya bajaran, zêdebûna gelheyê dewam dike[22].

Li gorî tecrubeya Haîtiyê, ji bo serederiya li encamên karesatên xwezayî pêwîstî bi reformên binyadî û kapasîteya sazûmanî ya bihêz heye. Ji bo Tirkiyeyê jî di serî de xurtkirina sîstema hiqûqî û têkoşîna li dijî gendeliyê, divê pêngavên ji bo damezirandina serweriya hiqûqê bêne avêtin. Tenê bi vî awayî dikare bandorên êş û wêraniya ji ber karesatan kêm bibe û civak dikare

21 bnb.

22 Sael, E. (dnz.). A decade after the earthquake, Haiti still struggles to recover. The Conversation. https://theconversation.com/a-decade-after-the-earthquake-haiti-still-struggles-to-recover-129670 (dîroka tikandinê: 10.06.2023)

Wene: https://www.actionaidusa.org/wp-content/uploads/2018/04/Volunteers-save-bricks-Vlad-Sokhin-150945scr.jpg

pêşerojeke ewletir û dadmendtir ava bike.

5.2. Nepal

Di 25'ê Nîsana 2015'an de li herêma Gorxa ya Nepalê erdhejek bi dijwariya 7.8 çêbû û nêzî 9 hezar kesan jiyana xwe ji dest da, zêdetirî 20 hezar kes birîndar bûn û 750 hezar avahî xirab bûn. Her wiha bi sed hezaran nepalî ji cih û warên xwe bûn û bê mal man. Erdhejê li ser gel ku hê trawmayên şerê navxweyî yê di sala 2006'an de ji ser xwe neavêtibûn, bandoreke mezin çêkir. Li vir, ji bo ku bandora erdhejê ya li ser gelê Nepalê, bêaramiya siyasî û bêedaletiya karesatê baştir were fêhmkirin, em girîng dibînin ku bi kurtasî li şerê navxweyî û pêvajoya ku bi şerê navxweyî re pê de çû, binêrin.

Şerê navxweyî, di sala 1996'an de piştî ku hikumetê çalakiyên komunîst tepeser kirin û nehişt Partiya Maoîst Komunîst a Nepalê (CPN-M) bikeve hilbijartinan, bi nakokiya di navbera hikumet û CPN-M'ê de dest pê kir[23]. Di vê navberê de komunîstan monarşî rakir û li dijî xizanî, gendelî û bêedaletiya civakî têkoşîn meşand, bi armanca avakirina komareke gel desteka nepaliyên li gundewaran bi dest xist. Di salên destpêkê yên serhildanê de hêzên ewlehiyê yên Nepalê tundî û binpêkirina mafan kir. Lê komunîstam piraniya herêmên gundewar ên welêt kontrol kir û qral Gyanendra di Nîsana 2006'an de li hemberî mezinbûna xwepêşandanên mezin û partiyên siyasî ku li dijî monarşiyê bi komunîstan re eniyeke hevpar ava kir, dest ji desthilatê berda û di navbera hikumeta demokratîk a nû û CPN-M'ê de peymana aştiyê hat îmzekirin[24].

Nêzî deh sala plana bersivdayîna karesatê bi rojeva mijûl a siyaseta destûrê hatibû tepisandin. Kêmasiya ekîbên alîkariya lezgîn û rizgarkirinê, artêş û polîsên seferber, li gel nebûna plansaziyê, bi giştî wekî "kujerê bêdeng" ê civakê hat pênasekirin[25]. Li welatekî ku polîtîkayeke hesab jê nayê xwestin, hebe, mirov dikare bibêje zirara erdhejê ne encama karesateke xwezayî ye, lê belê neserkeftîbûna hikumetê ye ku çavkaniyan ji bo avahî û pirsgirêkên binesaziyê bi kar nayne[26]. Di demên piştre de jî kêmasiyên di belavkirina alîkariya karesatê de dewam kir, kesên ku bi hikumetê re pêwendiya wan a siyasî heye, bêalîkarî zêdetir gihaştinê. Vê jî zehmetiyên erdhejzedeyan girantir kirin. Mirov dikare bibêje ku bi taybet vê erdhejê bandor li jinan kiriye. Jin û rêxistinên femînîst ên sivîl ku bi giranî li ser mafên jinan dixebitin, di pêvajoyên piştî şer û piştî karesatê de, di pêvajoyên jinûveavakirina aştiya domdar û jinûveavakirina welêt de roleke sereke lîstiye. Em bi taybetî di çarçoveya vê raporê de balê dikêşin ser hewldanên herî sereke yên mafparêziyê:

•

Rêxistinên jinan di asta neteweyî û navneteweyî de çalakiyên mafparêziyê kirin, hem ji bo bidestxistina edaletê û hem jî guhertinên demdirêj ên ku dubarenekirinê mîsoger dikin.

Saziyên civaka sivîl ên wekî WOREC, Saathi, Nagarik Aawaz û Action Works, ji bo hesabpirsîna ji hikumetê, afirandina çavkaniyên ku mexdûran digihînin dadmendiya[27] dema derbasbûnê, ji bo rêveçûna lêgerîna mafan û avakirina têkiliyên di navbera saziyên hikumetê û rêxistinên herêmî û jinan de, bi xebatên raporkirin û şopandinê dixwazin jinan bigihînin dadmendiyê. Di dema erdhejê de, her çend hat dîtin ku beşeke mezin a xebatên Komîsyona Heqîqet û Lihevkirinê (KHL) nekarî bê temamkirin û ji ber ku li Nepalê bi hêsanî rewşa siyasî bandor lê dikir, nekarî bi awayekî aktîf bê bikaranîn. Lê saziyên civaka sivîl di navbera mexdûran û pêvajoya edaletê ya fermî de bûn pirek[28]. Rêxistinên navborî serpêhatiyên karesat û tundiyê ji KHL'ê re ragihandin û di warê binpêkirina mafan a di demên pevçûnê de an jî têkiliya kesên karesatê bandor lê kiriye bi dadgehên ku KHL'ê dikare organîze bike re peywendiya xwe bi Komîteya Aştiyê ya Herêmî re danîne[29].

Xebatên lobiyê yên sereke yên saziyên sivîl ên jinan, ji bo zêdekirina temsîla jinan a di Komîteyên Aştiyê yên Herêmî, KHL û kabîneyê de, dirêjkirina dema demderbasbûna sûcê tecawizê, peydakirina mafên milkiyetê ji bo jinan û ji bilî krediyên erdhejzedeyan ên ji hikumetê wergirtine, malbat dikarin alîkariyê ji saziyên civaka sivîl wergirin. Her wiha gelek jinan diyar kiriye ku ji dema bidawîbûna şer û erdhejê ve di mijara mafên jinan de pêşketineke girîng pêk hatiye. Di nav van de ji bo jinên bî fona lezgîn, herî kêm ji sedî 33'ê jinan beşdarî Komîteyên Aştiyê yên

23 Briana Mawby, Anna Applebaum. 2018. "Rebuilding Nepal: Women's Roles in Political Transition and Disaster Recovery". Georgetown Institute for Women, Peace and Security.

24 bnb.

25 Krishna K. Shrestha, Basundhara Bhattarai, Hemant R. Ojha, Ayusha Bajracharya. 2018. "Disaster Justice in Nepal's Earthquake Recovery". International Journal of Disaster Risk Reduction, https://doi.org/10.1016/j.ijdrr.2018.10.006.

26 bnb.

27 Briana Mawby, Anna Applebaum. 2018. "Rebuilding Nepal: Women's Roles in Political Transition and Disaster Recovery". Georgetown Institute for Women, Peace and Security.

28 Bandana Rana. 2016. "Interview with the research team". Saathi. Nakkhu: Lalitpur.

29 Susan Risal. 2016. "Interview with the research team, 'A Year after the Earthquakes'". UN Women. (dîroka tikandinê: 12.06.2023)

Herêmî bûn, bacên kêm ji bo jinên ku navê xwe li ser zeviyan qeyd dikin û jinên Nepalê di pozîsyonên siyasî yên payebilindtir de cih bigirin û hwd wek encamên erênî yên lêgerîna edaletê ya jinan in. Têkoşîna piştî karesatê ya ji bo mafan a saziyên sivîl ên jinan ên li Nepalê, nîşanî me dide ku meşandina xwegihandina edaletê bi mekanîzmayên fermî, bi taybetî li herêmên di bin bandora pevçûnê de ne, her tim ne pêkan e. Piştî karesatê lêgerîna heqîqetê ya komên piştî karesatê cudakarî lê tê kirin, hem bi pevçûn hem jî bi karesatekê tê talîkirin. Gelekî girîng e ku ev kom bikarin rastiya xwe bînin ser ziman, binpêkirin û bêgaviyan tespît bikin, pêwîstiyên temîratên pêwîst tespît bikin û lêgerîna xwe ya edaletê bidomînin. Di doza Nepalê de, di encama xebatên WOREC'ê yên li ser belgekirina tundiya li hemberî jinan a piştî karesatê de, em di wê baweriyê de ne ku berfirehkirina mekanîzmaya ji bo ragihandina destavêtinê ji bo Tirkiyeyê jî wek qezenceke ji bo tomarkirina rastiyê bi qîmet e. Li gorî vê yekê, em li bendê ne ku saziyên sivîl ku li herêma karesatê pevçûn û cudakariya li dijî wan dewam dike û rêbazên têkoşîna li dijî wan, şert û mercên bêhempa û pêwîstiyên herêmê li ber çavan bigirin, tev li pêvajoyên restorasyona piştî karesatê bibin. Em careke din îşaretê bi xebata parêzvaniyê dikin ku ev saziyên sivîl dê ji bo çareserkirina cudahiyên di hewcedariyên tezmînata piştî karesatê de ji bo komên ku bi sîstematîk rastî cudahiyê tên, pêk bînin. Em dibînin ku saziyên sivîl ên li Nepalê di erdhêjê de bi rêbazên wekî raporkirin, çavdêrî, berhevkirina pereyan û avakirina têkiliyan ji bo gihaştina jinan a edaletê, di pêvajoya erdhejê de di navbera rêxistinên sivîl ên mexdûr û pêvajoya edaletê ya fermî de pir girîng e û em di wê baweriyê de ne ku ev rêbaz ji bo gihaştina edaleta piştî karesatê li Tirkiyeyê xwedî girîngiyeke mezin in.

6. PÊŞNIYARÊN JI BO POLÎTÎKAYÊ

Pêşniyarên ji bo Parlamentoyê:

1. Divê qanûna têkildarî erdhejê ji bo ku hesabdayîn û mafên mirovan tê de serdest bin, bê nûkirin. Nûkirina qanûnên heyî yên li ser plansaziya bajaran û rêveberiya karesatê, divê mijarên wekî avahiyên li herêmên di bin rîska erdhejê de, rojanekirina pîvanên avahîsaziyê û kontrolên îdarî çareser bike. Li gorî daneyên zanistî yên rojane, divê polîtîkayên avahîsaziyê li ber çavan bên girtin û ji bo mîsogerkirina saxlemiya avahiyan a li hember erdhejê, pîvanên teqeztir bên destnîşankirin. Her wiha divê mekanîzmayên teftîşê bên xurtkirin û ahengiya avahiyan a bi van pîvanan bi rêk û pêk bê kontrolkirin. Lê ev bi tena serê xwe têrê nake.

Di karesatên piştre de; ji bo ku îhmalkarî, bêplanî û bêdadmendiya binyadî bi têgehên wekî qeder an jî karesatê neyên pênasekirin û careke din dubare nebin, divê gavên şênber bên avêtin. Divê were qebûlkirin ku baca erdhejê (baca ragihandinê ya taybet) ku ji sala 1999'an ve ji gel tê stendin, di karesatên mîna erdheja 6'ê Sibatê de bi rengekî bibandor nikare bê bikaranîn û ev bac bê rakirin. Li şûna vê, divê analîzên rîska beriya karesatê û plansaziya karesatê bên xurtkirin. Divê ev plan li gorî faktorên wekî zayend, etnîsîte, rewşên civakî-aborî, çînî û cudahiyên çandî li ber çavan bên girtin û bi wî awayî bên amadekirin.

2. Mîsogerkirina hesabdayînê, ji bo ku bi awayekî bibandor qanûn werin sepandin û li gorî qaîdeyan tev bigerin. Piştî 6'ê Sibatê, ji bo pêkanîna dadmendiyê pir girîng e ku ne tenê berpirsên di nava sektora avahîsaziyê de yan jî fîrmayên avahîsaziyê yan yên materyalan didizin, di heman demê de berpirsyarên siyasî wekî rêveberiyên herêmî yên destûrnameyên avahiyan didin ku ji bo pêşketinê ne guncaw bin û burokrasiya navendî ku xwedî wê berpirsyariyê ye ku pîvanan ava bike û di asta neteweyî de teftîşan bike. Di navbera saziyên çavdêriyê û dadgeriyê de divê hevkarî were mîsogerkirin û pêvajoyên lêpirsîn û darizandinê yên bibandor werin meşandin. Di vê çarçoveyê de, avakirina dadgehên serbixwe dikare bingeheke qanûnî ya pêbawer peyda bike, ji bo mirovên ji karesatê rizgar bûne yên li edaletê digerin. Divê ji bo reformekirina sîstema dadgeriyê ku mîna tecrubeya Haîtiyê bi kêr nayê, xebatan bidin destpêkirin û bi taybetî balê bikişîne ser dijberiya wê ya li dijî gendeliyê. Tecrubeya li Haîtiyê girîngiya sîstema dadgeriyê ya di pêvajoya başkirina piştî karesatê de, radixe ber çavan. Divê Tirkiye di pergala xwe ya dadmendiyê de li ser reformên saziyî bisekine da ku herî baş zirarên karesatan çareser bike û baweriya gel ji nû ve vegerîne. Divê ev mijarên wekî nirxandina qanûnan, mîsogerkirina serbixwebûna dadgeriyê û têkoşîna li dijî gendeliyê jî bigire nava xwe. Wekî din, serkeftina reforma dadgeriyê ya li Tirkiyeyê, ji ber bêbaweriya ji dewletê, divê ji aliyê rêxistinên civakî yên sivîl û navneteweyî ve ji nêz ve bê şopandin. Çavdêrî û tevlêbûna derveyî ya bi vî rengî, dikare zelaliya pêvajoya reformê xurt bike, berpirsyariyê mîsoger bike û baweriya civakê ya bi sîstema dadmendiyê zêde bike.

3. Divê qanûna revîzekirî ji serdestiya mafên mirovan tawîzan nede û divê di pêvajoya piştî erdhejê yên xwegihandina alîkariyan, starbûn û jinûveavakirinê de tehemulê li cudakariyê neke. Her şêwe cudakarî û tundiya li hemberî mirovên di erdhejê de sax mane, divê cezayên giran lê bên ferzkirin. Di vê çarçoveyê de, bi taybet nêrîna li erdhêjê ya li gorî zayenda civakî, wek pêwîstiyeke bingehîn derdikeve holê. Divê bi feraseta ku karesat bi awayên cuda bandorê li jinan û LGBTÎ+'an dike û di jiyana wan de encamên cuda çêdike û normên zayendî rasterast bandorê li encamên karesatê dikin, kar û xebat dest pê bike. Divê rêbazên bersivdayîna karesatê li ser esasê vê pêşdîtinê bi nirxandina analîza zayendî bê diyarkirin. Daneyên pêbawer, jihevcudakirî û li gorî zayenda civakî, divê hem berî û hem jî piştî karesatê bên girtin.

4. Prensîba zelaliyê divê di pêvajoyên komkirina daneyên piştî karesatê de bê pejirandin. Kesên ku ji karesatê bê birîndarî xelas bûne yan jî bê zirar jê filitîne û kesên di karesatê de jiyana xwe ji dest daye, divê bên tespîtkirin

û agahiyên li ser van kesan bên bidestxistin. Daneyên têkildarî ka hikumet, rêxistinên sivîl an jî alîkariyên takekesî çi qas gihaştine kesên saxmayî jî divê bên berdestkirin. Ji ber ku di heman demê de beşeke girîng a lêgerîna heqîqeta piştî karesatê ye, divê xwegihandina zelal a van daneyan hebe. Her wiha, ji bo kesên ji karesatê rizgar bûne, cih veke da ku tecrubeyên xwe parve bikin, rastiyên ji ber karesatê hatine afirandin û îdiaya hebûna yekane heqîqeta ku dewletê derxistiye holê bişikîne, rê li ber lêgerîna mafan vedike.

5. Ji bo serperiştiya sazkirina mekanîzmayên dadmendiyê yên piştî erdhejê û lêkolînkirina rastiyan, divê komîsyonek bê avakirin. Tevî ku di nava şert û mercên heyî de komîsyoneke berfireh a heqîqetê rasteqîn nîn e jî, ji bo ku bi lez û bez bikeve nava tevgerê dikare komîsyoneke lêkolînê ya parlamentoyê bê avakirin. Ev komîsyon dikare ji bo rastiya tiştên berî erdhejê û piştî erdhejê rû dane, derxe holê, bikare asta binpêkirinan diyar bike, mexdûr û sûcdaran tespît bike û di dawiyê de jî agahiyên bi dest ketine, ragihîne. Li gorî vê komîsyonê, ji bo çavdêrîkirina şert û mercên taybet ên li herêmê û berhevkirina îfadeyên kesên li herêmê rasterast bêyî astengiyên burokratîk ên li pêşiya wan, dikarin komîsyonên jêrîn ên bajaran werin avakirin. Bi vî awayî pêvajoyeke berdest tê avakirin ku kesên saxmayî û mexdûr di nav pêvajoyê de cih digirin û subjektîfiya wan tê naskirin. Her wiha divê çavdêrî û tecrubeyên saziyên civaka sivîl ên li qadê dixebitin ji aliyê komîsyonan ve li ber çavan bên girtin.

6. Erkdarkirina komîsyonê divê li ser esasên serxwebûn û bêalîbûnê be. Mekanîzmayên wekî xwegihandina çavkaniyên pêwîst ên ji bo lêkolînê, mafê şahidan ê şahidiyê, komkirin û nirxandina delîlan, divê bên peydakirin. Her wiha pir girîng e ku xebatên komîsyonê bi zelalî bên kirin, ev tespît bi raya giştî re bên parvekirin û pêşniyar ji hêla hikumetê ve li ber çavan bên girtin. Erka çavdêriya pêkanîna pêşniyaran di serî de li ser muxalîfan e. Divê aliyên muxalefetê bi derxistina îradeyeke siyasî ya hevbeş pêvajoyê bişopînin.

7. Divê hikumet, Serokatiya Rêveberiya Karesat û Rewşên Awarte (AFAD) ku di bin banê Wezareta Karên Hundir de dixebite û rêveberiyên herêmî ji ber îhmal û windakirina mafan a berî û piştî erdhejê, lêborînê ji welatiyan bixwazin. Wekî ji roê di bin sernavê sêyemîn de tê behskirin, trawmaya navîn a berî erdhejê û piştî erdhejê rû daye, nemaze ji ber xemsariya di pêvajoya rêvebirina karesatê de, zirarê dide hesta baweriya di navbera welatî û dewletê de. Lêborîna fermî dikare bibe pêngaveka yekem ji bo asayîkirina peywendiyên di navbera dewletê û welatiyan de. Lê helbet lêborîna fermî bi tena serê xwe têra restorasyona pêdiviyên erdhejzedeyan nake. Lewma divê bernameyeke restorasyonê ya berfireh bê çêkirin û bikeve meriyetê.

8. Ji bo naskirina êşên erdhejzedeyan û telafîkirina windahiyên wan ên madî û manewî, divê bernameyeke berfireh a restorasyonê bê amadekirin. Divê ev bernameya han piştevaniya pêvajoya başbûna qurbaniyên erdhejê ji çend aliyan ve bike. Divê bername pêvajoyeke tezmînatê ya adil û lezgîn pêşkêş bike. Mesrefên ku ji bo restorasyon an jî jinûveavakirina xaniyên xerabûyî tên xwestin, divê bi piranî ji aliyê dewletê ve bên dabînkirin. Di pratîkê de piştgirî bi rêbaza kredî û deynan tê dayîn, lê belê ev yek ne rêbazeke adil e, ji bo bi hezaran welatiyên ku ne tenê malên xwe, lê cihên xwe yên kar di erdhejê de winda kirine yan jî astengdar bûne û ji ber erdhejê nikarin bixebitin. Ji bo vê jî divê çêkirina bernameya restorasyonê ya ku bikeve meriyetê, li gorî hewcedariyan be ku bi rêya komîsyonên pêşniyazkirî werin kirin. Ji bo pêdiviyên xweser ên erdhejzedeyan bên dabînkirin, divê nêzîkatiyeke li gorî kirdeyan bê qebûlkirin. Her wiha divê bername ne tenê li ser zirara madî, ji bo ku mexdûrên erdhejê bi trawma û windahiyan re hevrû bibin mekanîzmayên piştevaniya psîko-sosyal bên avakirin.

Pêşniyarên ji bo Rêveberiyên Herêmî:

1.Kapasîteya rêveberiyên herêmî yên ji bo koordînekirina alîkariya di asta civatê de, başbûn û xwegihandina xebatên edaletê bên zêdekirin. Hikumetên herêmî rolên girîng ên wekî fehmkirina pêdiviyên civatê yên piştî erdhejê, birêvebirina çavkaniyan û dabînkirina pêvajoyeke adil a başbûnê dilîzin. Divê xebatkarên rêveberiyên herêmî li ser pêkanînên di pêvajoya başkirina piştî erdhejê de bên perwerdekirin. Ev perwerde dê qabiliyeta karmendên rêveberiyên herêmî bi hêztir bike ji bo nirxandina rîskên erdhejê, pêkanîna plansaziya awarte û piştgiriya ji bo hewcedariyên civatan. Divê hikumeta navendî zêdetir çavkaniyan ji rêveberiyên herêmî re veqetîne û erkdariya xwe berfireh bike û ev jî dihêle ku xebatên başkirinê ya piştî erdhejê bi awayekî bi bandortir bi rê ve bibin.

2. Divê di navbera rêveberiyên herêmî yên li herêmê de hevkarî û koordînasyon were xurtkirin.

Hevkarî û mekanîzmayên koordînasyonê yên xurt ên di navbera rêveberiyên herêmî de, di rewşên awarte de bersiveke lezgîn çêdike. Piştî erdhejê em dikarin bi hev re tev bigerin û pêdiviyên lezgîn ên piştî erdhejê bi cih bînin, tedbîrên ewlekariyê bigirin û alîkariyê bi rengekî koordîneyî teslîm bikin. Xurtkirina hevkarî û koordînasyonê di navbera rêveberiyên herêmî de, ji bo parvekirina zanebûn û tecrubeyan rê vedike. Hikumetên herêmî yên di pêvajoya başkirina piştî erdhejê de serkeftî ne, dikarin rê li ber yên din bigirin û pratîkên herî baş parve bikin. Ev yek dibe alîkar ku stratejiyên baştir werin bipêşxistin û pêşî li dubarekirina şaşiyên berê bigirin.

3. Divê rêveberiyên herêmî beşdariya aktîf a gelê xwecih a li pêvajoya başkirina piştî erdhejê teşwîq bikin. Rêveberiyên herêmî komîsyonên ku ji bo aşkerakirina rastiyan bên avakirin, ji bo ku mirovên xwecih tev li biryardayînê bikin da ku hewcedariyên erdhejzedeyan baştir werin fehmkirin. Jinûveavakirina bajarên karesat lê rû daye, divê ne tenê li ser rakirina xirabeyan û lêkirina avahiyên nû be. Divê bê qebûlkirin ku yên di karesatê de hatin hilweşandin ne tenê avahî bûn, ew avahî ji bo Ereb, Kurd, elewî, Erebên xiristiyan, Suryan, Çerkes û Ermenan ku nasnameyên wan bi qadên jiyanê ve girêdayî bûn, girîng bûn. Jinûveavabûna li ser bingeha vê pêşniyazê, divê li ser parastina cihêrengiya çandî ya heyî be, ne hilweşandina wê. Bi nêzîkbûna hilbijartinên herêmî yên Adara 2024'an re, divê kampanyayên hilbijartinê yên bersivê didin pêdiviyên taybet ên herêmî, werin organîzekirin.

4.

Şaredarî însiyatîfên bîrdarîkirinê jî bixin nava pêvajoyên jinûveavakirinê. Ji bo derxistina tesîrên hestî û çandî yên êş û azaran û ji bo kesên ku bandora erdhejê lê bûye bi awayekî bi rûmet bên bibîranîn, li bajarên ku erdhejê bandor li wan kiriye, cih/mekanên bîrdariyê dikarin bên afirandin. Dema ku bajar ji nû ve tên avakirin, şaredarî dikarin bi xebatên wekî çêkirina bîrdariyan û çêkirina muzexaneyên bîrdariyê tev bigerin. Dema van deran diafirînin, divê daxwazên saxmayiyan, rîtuelên wan ên bîranînê û cudahiyên çandî yên navbera civakên herêmî de, li ber çavan bên girtin. Înîsiyatîfên bîrdarîkirinê, bêyî ku paşeroja biêş ji bîr bikin, ji bo ku bi hêviyekê li siberojê binêrin, pir bi nirx in.

Pêşniyarên ji bo Civaka Sivîl:

1. Divê civaka sivîl hem di plansaziya beriya karesatê û hem jî di pêvajoyên bersivdayîna karesatê de tevna piştgiriyê red neke. Divê were qebûlkirin ku her rêxistineke sivîl di qada xwe de xwedî hêz û jêhatîbûneke hêja ye, divê veguhastina agahdarî û yekrêziya hevbeş hem di navbera dewlet û saziyên civaka sivîl de û hem jî di navbera saziyên civaka sivîl de were mîsogerkirin û têkiliyên heyî bên xurtkirin.

2. Divê rêxistinên civakî yên sivîl maf û berjewendiyên erdhejzedeyan biparêzin û destekê bidin mafên wan ên heqîqet, dadmendî û restorasyonê. Di vê çarçoveyê de rêxistinên mafparêz hem bi awayekî şexsî hem jî kollektîf dikarin kampanyayên hişyarkirina gel organîze bikin û di asta neteweyî û navneteweyî de çalakiyên piştgirîdayînê pêk bînin. Heke komîsyonên ji bo lêkolînkirina heqîqetên li ser erdhejê werin avakirin, divê civaka sivîl polîtîkayan hilberîne û zextê li biryardêran bike ku tev li pêvajoyan bibin. Ji bo civatên ku bandor li wan bûye, divê desteka psîko-sosyal were kirin, desteka ku tê dayîn were domandin û her wiha ji bo ku mirovên ku sax mane bi pêvajoyên burokratîk re serederiyê bikin, divê desteka hiqûqî were dayîn. Rêxistinên mafên mirovan û torên wekî Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD), Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (YÎHV) û Tora Piştgiriyê ya Parêzvanên Mafên Mirovan (ÎHSD) gelekî girîng e ku bi rêxistinên sivîl ên li qadê re di nava piştgiriyê de bin, da ku destekê bidin lêgerîna mafên xwe ya civatên ku bandora karesatê lê bûye.

3. Civaka sivîl divê binpêkirina mafên mirovan, windahiyên canî û wêraniya ji ber erdhejê, ji bo siberojê belge bike û arşîv bike. Belgekirin û lêkolînên arşîvkirinê yên ji aliyê civaka sivîl ve bên kirin, dê bikin ku wêranî, windahî û binpêkirinên mafên mirovan ên ji ber aliyên siyasî yên karesatê û her wiha aliyê xwezayî yê karesatan bên qeydkirin. Lêkolînên li ser mijarên mîna newekheviya li pêdiviyên bingehîn û cudakariya nasnameyî ya piştî lêgerîn-rizgarkirin û karesatê, dê bi belgekirina heqîqetê re lêgerîna edaletê ya kesên saxmayî xurttir bike. Di van xebatan de dê parlemento û rêveberiyên herêmî di pêşxistina polîtîkayên kêmkirin/astengkirina wêrankirin û binpêkirinên mafên mirovan ên piştî karesatên siberojê bi rê ve bibin. Her wiha, di rewşa avabûna komîsyoneke gengaz a lêkolînkirina heqîqetan de, daneyên hatine komkirin, dibin çavkaniya xebatên komîsyonê jî.

4. Wekî ku tecrubeyên Nepalê yên piştî erdhejê nîşan didin, rola rêxistinên civakî yên sivîl di lêgerîna edaletê û di pêvajoyên restorasyonê yên jin û LGBTÎ+'an de esas e. Di vê çarçoveyê de bi xurtkirina rêxistinên civaka sivîl re tê hedefkirin ku pêdiviyên jinan û LGBTÎ+'an ên piştî karesatê pêk bên û piştgiriyê bidin lêgerîna wan a edaletê. Divê karîgeriya rêxistinên civaka sivîl bi alîkariya çavkaniyên darayî, bernameyên avakirina kapasîteyê û mekanîzmayên beşdarbûnê ji bo saziyan zêde bibe, da ku bikarin

bersiva pêdiviyên qurbaniyên karesatê bidin û dengê xwe bigihînin beşên mezin ên civakê. Ev polîtîka dê xwegihandina jinan û LGBTÎ+'an a li dadmanediyê xurt bike û destekê bide dadmendiya civakî.

Pêşniyarên ji bo Civaka Sivîl a Navneteweyî:

1. Civaka sivîl a navneteweyî, ji bo rêxistinên civakî yên sivîl ên xwecih ên piştî erdhejê di xebatên dadmendiyê de cih digirin, dikare însiyatîfên avakirina kapasîteyê bi pêş bixe. Ew dikare li ser belgekirin, parêzvanî û beşdariya civakê perwerdehyê bide û ji bo piştgiriya çalakiyên mirovahî, ji bo dabeşkirina çavkaniyan, dikare piştgiriya projeyên avakirina kapasîteyê bike. Di vê çarçoveyê de rêxistinên navneteweyî ku bikarin alîkariya mirovî û rêxistinên ku desteka saziyî pêşkêş dikin, dikarin cudahiyeke rêgezî di dabeşkirina çavkaniyan de pêk bînin. Ji ber vê yekê, xurtkirina saziyên civaka sivîl ên xwecih ji bo destpêkirina pêvajoya xwegihandina dadmediyê ya piştî erdhejê, dê neyê paşguhkirin.

2. Civaka sivîl a navneteweyî dikare parvekirina zanyariyan hêsan bike û veguhastina tecrubeyên di navbera Tirkiye û welatên din de ku pêvajoyên heman piştî karesatê lê rû dane, hêsantir bike. Ev parvekirin dê nîşan bide bê ka çalakiyên piştî karesatê yên rêxistinên civaka sivîl ên li herêmên ku karesatê lê rû daye, bersivê didin pêwîstiyên kesên di karesatê de mane û bandorê li pêvajoyên plansaziya restorasyon û karesatê dikin. Rêxistinên civaka sivîl û biryardêrên li Tirkiyeyê dikarin ji vê veguhastina tecrubeyan sûdê wergirin, li ser gavên ku divê werin avêtin û ew dikarin van tecrubeyan bi tena serê xwe bi kar bînin. Li gorî taybetmendiyên xwe yên civakî-çandî dikarin di rêvebirina pêvajoyên piştî karesatê de rêbazên nû bi pêş bixin. Ev parvekirina zanyarî û tecrubeyan dihêle ku civakên ji çarçoveyên cuda yên çandî û erdnîgarî de zehmetiyên ku rastî wan tên, fêm bikin û pêşniyarên çareseriyê parve bikin. Ev pêvajo, bi pêşxistina projeyên hevbeş, peydakirina alîkariya teknîk û belavkirina wekhev a çavkaniyan, ji bo başkirina piştî karesatê ya wekhev û domdar tevkariyê dike.

3. Civaka sivîl a navneteweyî dikare destekê bide biryardêrên li Tirkiyeyê da ku piştî erdhejê mekanîzmayên dadmendiyê bi cih werin. Ev rêxistinên han dikarin bi rêya çalakiyên parêzvaniyê tekeziyê li ser mafên qurbaniyên erdhejzedeyan bikin û fişarê bixin ser biryardêran da ku dadmendiyê yê pêk bînin û piştî erdhejan pêkanîna dadmendiyê û siyaseta dadperwerane bi cih bînin. Her wiha, rêxistinên sivîl ên navneteweyî dikarin lobiyê bikin da ku dengên qurbaniyên erdhejê bigihînin, hişyariya biryardêran bilind bikin û guherînên polîtîkayê jî teşwîq bikin.